Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :431 nameronahi@gmail.com 10- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Gav bi gav rizgarkirina Minbicê –2–

Cûma MIHEMED
Şîlan MIHEMED

Li taxên Minbicê şerên dijwar di navbera şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê, Hêzên Sûriya Demokratîk û çeteyên DAIŞ`ê de diqewimîn.
Di encamê de hêzên ku pêşengiya hemleya rizgarkirinê dikirin bajar bi tevahî ji çeteyan rizgar kir. Rizgarkirina Minbicê, şerê li dijî DAIŞ`ê xiste pêvajoyeke nû.
Dengê teqîna gule û bombeyan li Minbicê bilind dibe, şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) êdî li ber dergehên Minbicê ne. Her kes li bendê ye ku şer bigihîje nava bajêr, her wiha her kes li bendê bû ku dê şerên dijwar li kolanên bajêr biqewimin, ji ber ku bajarê Minbicê xwediyê cihekî girîng ê leşkerî û siyasî ye.
Bajarê Minbicê ji bo çeteyan navendeke girîng a stratejîk bû ku çeteyên biyanî li wir kom dibûn, çeteyên ku ji Ewropayê di ser Tirkiyê re dihatin Sûriyê, her wiha yên ji Sûriyê û Iraqê vedigerîn Ewropayê, di Minbicê re derbas dibûn. Lewma fermaderekî leşkerî ku serkêşiya hemleya Minbicê dikir, gotibû Minbic paytexta DAIŞ`ê ye.
Şervanan bajarê Minbicê dorpêç kiribû, lê li derdorê jî şer ranewestiya, hin yekîneyên şervanan hîna jî gelek gundên ku di destê DAIŞ`ê de bûn, rizgar dikirin, yekîneyên din jî amadekariyên xwe dikirin ku bikevin bajêr.

### KÊLIYÊN KETINA BAJÊR

Ji gundê Hesen Axa ber bi gundê Kabircê yê nêzî navenda (Metahin) li başûrê bajêr, şervan di van gundan re derbas bûn. Li gorî ku fermandarê tabûrên Şems El-Şimal Egîd Şems El-Şimal dibêje; berê wan li navenda Metahin (avahiya aşan) bû ku nêzî taxên li başûrê bajêr e.
Hewldanên destpêkê yên têketina bajêr li vê deverê dest pê kirin, avahiya Metahin bilind bû, avahiya herî bilind û mezin bû li bajarê Minbicê, yên ku bikevin navenda aşan dê karibin herêmeke fireh û taxên derdorê kontrol bikin. Lewma şervanan destpêkê berê xwe da wê deverê û ji wir ber bi bajêr ve bi pêş de çûn.
Egîd der barê şerên li navenda aşan de wiha dibêje: “4 yekîne ketin navenda aşan, dem berêvarkî bû, pevçûnên dijwar qewimîn ji ber ku çeteyan gelek xendek û tunelên binerd kolabûn, segvan jî li ser avahiyan belav kiribûn, li derdorê gelek mayin çandibûn, bêhtirî 500 mayinan çandibûn, di encamê de hinek hevalên me şehîd bûn.”
Egîd wiha pê de çû: “Rewş aloz bû, mayin bi teknîkên pêşketî hatibûn çêkirin, em neçar man du rojan rawestin, paşê me dîsa şer kir, şerê di nava avahiya aşan de şerê xendek û tunelan bû, çeteyan ji tirsa bombebarana balafiran nekarîn ji xendekan derkevin.”
Egîd dibêje ku şerê destpêkê û yê herî dijwar di pêvajoya rizgarkirina Mibicê de, şerê navenda aşan bû û wiha dewam dike: “Astengiya herî mezin xendekên binerd bûn, eger me karîba wan xendekan bigirin me dikarî bi hêsanî navendê rizgar bikin, lê me cihê xendekan nedizanî, tenê çaxê ku çete derdiketin û êrîşî me dikirin me cihê xendekên wan jî didît.”
24 şervan tev li şerê li navenda aşan bûn, ew 4 kom bûn, paşê 12 şervanên din jî tev li wan bûn û pevçûnên dijwar rû dan, şer çend rojan dewam kir û bi rizgarkirina navenda aşan bi dawî bû.

### LI NAVENDÊ ŞER DEST PÊ DIKE


Fehed Elabide şervanê tabûrên Şems El-Şimal e, ew jî di nava şerên li avahiya aşan de bû. Fehed Elabide kêliyên destpêkê yên vî şerî wiha tîne ziman: “Yekîneya me ji 4 şervanan pêk dihat, em bi awayekî veşartî nêzî avahiya aşan bûn heta ku em nêzî çeteyan bûn, me dengê axaftinên wan dibihîst, me destpêkê bombeyên dest avêtin wan û paşde vegeriyan, paşê me bi RBG`ê li wan da, me sê caran hewl da bikevin avahiyê li me nikarîbû.”
Bi qasî ku tê bîra Fehed şer ji saat 19.00`an heta 03.00`yan ber destê sibê dewam dike, şervan dikevin nava avahiyê lê çeteyên DAIŞ`ê jî hîna di avahiyê de ne.
Fehed wiha pê de çû: “Em çûn ser banê avahiyê, lê çete hîna li jêr bûn, me li jêr dinêrî, me çete ditînin, em heta roja din di dorpêçê de man, nêzî nîvro hevalên me hatin û dorpêç şikand.”
Piştî şerê avahiya aşan bi dawî bû, Fehed jî çû eniya taxên rojava yên Minbicê û tev li têkoşîna rizgarkirina rojavayê bajêr bû.

### DI NAVA TAXAN DE ŞER

Piştî serkeftina herî mezin a hemleyê (rizgarkirina avahiya aşan), şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê berê çekên xwe da taxa Elkişî ku nêzî avahiya aşan e û taxa pêşîn a li başûrê bajêr e.



Yekîneyên ku avahiya aşan rizgar kir, berê xwe da taxên bajêr, hin ji wan şervanan di pevçûnên avahiya aşan de şehîd bûbûn, yên mayî jî şerê rizgarkirinê dewam kir.
6 yekîneyên girêdayî tabûrên Şems El-Şimal ketin wan taxan û ji çeteyên DAIŞ`ê rizgar kirin, her yekîneyek ji wan ji 6 şervanan pêk dihat. Jixwe Egîd jî fermandarê Şems El-Şimal bû.
Egîd der barê têketina taxên bajêr de ev tişt anîn ziman: “Hin yekîneyên êrîşê hebûn, hinan jî parastina komên êrîşê dikir û li deverên rizgarkirî bi cih dibûn, carinan em bi qasî 800 metreyan di nava taxan de diçûn, li çep û rastê me çete hebûn, lewma pêwîst bû ku hin yekîneyên parastina me bikin hebin. Carekê hevalên me ketin nava taxan, çeteyan jî êrîşî çeperên me yên eniyên paş kir û sê çeperên me girtin, hevalên me yên li eniyên pêş jî ketin çemberê, ev tişt li taxa Elkişlî çêbû, heta berbangê jî me nedikarî bilivin ta ku du yekîneyên me hatin û hevalên di çemberê de rizgar kirin.”



Di dema pêşdeçûna di nava taxan de şervanan gelek astengî kişandin, meşa di nava kolanan de zor bû, li hawîrdor segvan hatibûn bicihkirin û kî biliviya gule berdidanê.
Egîd axaftina xwe wiha didomîne: “Meşa di kolanan de ne pêkan bû, şerê li Minbicê ne şerê kolanan bû, tu di kolanê de bimeşe tu yê bê kuştin. Me çawa şer kir, me di dîwaran de kun vekirin, em ji malekê diçûn a din û wiha pêşde diçûn, eger kolaneke servekirî jî hebûya, pêwîst bû bi paçikan bihata nixumandin, ji ber ku çete ji xendekên binerd derdiketin, diçûn ser banan û li şervanan dida.”
Egîd dibêje ku wan di pêvajoya şerên li taxa Elkişlî de carinan di malekê de 4 kun vedikirin û du kîlometreyan bi vî awayî pêşde diçûn.

### ÇETEYAN RÊBAZÊN CUDA BIKARDIANÎN

Beriya ku hemleya Minbicê dest pê bike, şervanên QSD`ê di şerên Kobanê û Girê Spî, paşê jî di şerên bendava Tişrînê de derbeyên giran li DAIŞ`ê dabûn. Hêza moralê ya çeteyan nemabû, lewma dest avêtin hin rêbazên cuda yên şer.
Li Minbicê çeteyan rêbaza segvaniyê bi kar anî, her wiha gelek mayin çandin, ev rêbaz jî nîşana qelsiya DAIŞ`ê bûn.
Egîd Şems El-Şimal di vê derbarê de wiha dibêje: “Pevçûnên rû bi rû gelek kêm bûn, çeteyan rêbaza segvaniyê bi kar dianî, gelek hevalên me bi guleyên segvanan an jî bi mayinan şehîd bûn, di nava malan de mayin danîbûn, te destê xwe biavêta çi mayinkirî bû, gelek mayin li taxa Hezawna hatibûn danîn.”
Egîd dibêje ku agahiyên wan der barê mayinan de kêm bûn, wan bi rêbazên amator carinan mayin diteqandin, carinan jî jê derbas dibûn û pêşde diçûn.
Egîd wiha pê de çû: “Agahiyên me der barê mayinan de kêm bûn, lewma gelek hevalên me di encama teqîna mayinan de şehîd bûn, çaxê em diketin hundirê malan, ji nişka ve mayinek diteqiya.”



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 431 10- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Hunermendên Cizîrê Aram Tîgran bi bîr anîn



Di salvegera 9’emîn wefata hunermend Aram Tîgran de li bajarê Qamişlo ku Aram Tîgran lê ji dayîk buye, hunermendên herêma Cizîrê şahiyek bibîranînê lidarxistin. Di şahiyê de bi dehan hunermend û her wiha şêniyên bajêr û Endamên Rêveberiya Xweser jî amade bûn. Di şahiyê de hunermendan stranên Aram Tîgran gotin.*R-7*

# TECRÎD ZILME Û LI DIJÎ MIROVAHIYÊ YE



Tecrîda şidandî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan her roj girantir dibe. Kurd û dostên wan jî ji rewşa Ocalan bi fikarin û her roj di nava tevgerê de ne. Ji bo rewşa Rêber Ocalan parêzer û hiqûqnasin Kobanê û Girkê Legê daxuyanî dan. Hat gotin ku tecrîda li ser Rêber Ocalan li dijî qanûn û pîvanên navnetewî ye û bang li saziyên mafên mirovan yên navnetewî kirin ku li hember Ocalan bi erka xwe rabin. *R-2*

Saziya Malbatên Şehîdan a Şengalê jî bi daxuyaniyekê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir. Kesên ku tevlî daxuyaniyê bûn axivîn û diyar kirin ku Rêber Ocalan li civaka Êzidî xwedî derket û wiha gotin, “Em ê weke civaka Êzidî heta dawiyê têkoşîna xwe ya ji bo azadiya Rêber Apo bidomînin. Her kesên ku dilê wan ji bo azadiyê lê dide pêwîste li rêber Apo xwedî derkevin.” *R-5*

## 3. Kongreya YJC‘ê hat lidarxistin



Sêyemîn Kongreya Yekîtiya Jinên Ciwan (YJC) roja 8’ê mehê li Navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran a li Rimêlanê bi beşdariya 800 delegeyên ji bakurê Sûriyê hat lidarxistin. Di kongreyê de xebatên du salan yên yekîtiyê hatin nirxandin û ji bo dema pêş biryarên girîgn hatin girtin. Her wiha di kongreyê de Meclîsa Jinên Ciwan ya Bakurê Sûriyê ji 23 endaman hat avakirin. *R-3*

## Xelatên pêşbirka Wêjeyê ya Şehîd Denîz Firat hatin dayîn



4’emîn Pêşbirka Wênekêşan, Çîrok û Helbestan a Şehîd Denîz Firat a bi pêşengtiya YXA’ê li Wargeha Penaber a Mexmûr’ê li salona konfaransê bi amadebûna sedan bejdarvanan, nûnerên saziyan û mêvanên derve hat lidarxistin. Xelatên 4’emîn Pêşbirka Wênekêşan, Çîrok û Helbestan a Şehîd Denîz Firat a ku diyarî şehîdê çapemeniya azad Rizgar Denîz hate kirin, hatin dayîn. *R-7*

## Dagirkeran li Şêrawa 25 kes revandin

Destdirêjî û hovîtiya artêşa tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê li herêma Efrînê berdewam dikin. Çavkaniyekî pêbawer ji navçeya Şêrawa ya Efrînê ragihand ku artêşa tirk û çeteyên wê bêtirî 25 welatiyên sivîl ên gundên Şêrawa revandin. Hat gotin ku ji wan 9 kes ji gund] Birc Heyder in. *R-2*

## Ziyana madî ya şerê li Sûriyê 400 milyar dolar e



Di civîna li paytexta Libnan Beyrûtê ku ji aliyê Komîsyona Civakî û Aborî ya Asyaya Rojava (CESAO) ku girêdayî Neteweyên Yekbûyî (NY) ye ve hate kirin, encamên madî yên şerê li Sûriyê hat nirxandin. NY’yê ragihand ku ji ber sedema şerê navxweyî yê ku ev 7 sal in li Sûriyê dewam dike, rê li ber ziyaneke madî bi qasî 400 milyar dolar vekiriye. *R-5*

## YPG’ê lê da, 6 leşker û çete hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG’ê bi daxuyaniyekê ragihand ku şervanên YPG/YPJ’ê li Efrînê li ser hev derbên giran li artêşa Tirk a digirker û komên çeteyên wê dixe. Navendê diyar kir ku di 3 çalakiyên cihê de bi giştî 6 leşker û çete hatin kuştin. *R-2*

## Çeteyekî Feyleq El-Şam hate kuştin



Çalakiyên şervanên YPG’ê li Efrînê li dijî çete û leşkerên dagirker dewam dikin. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê diyar kir ku di çalakiyeke taybet de yek ji çeteyên Feyleq El-Şam bi navê “Ehmed Mihemed Hemdan” li Cindirêsê hate kuştin. Hate gotin ku çete Hemdan ji parêzgeha Humisê ye û destên wî di rijandina xwîna gelê Efrînê de heye. *R-2*

## Hêzên Kurd divê yekîtiya xwe avabikin



Hevserokê KODAR’ê Fuat Bêrîtan diyar kir divê gelên Îranê û gelê Kurd ên li Rojhilatê Kurdistanê ji bo parastina nasnameya xwe ya civakî û siyasî têbikoşin. Bêrîtan wiha got, “Ji bo çareserkirina pirsgirêkên Îranê divê pirsgirêka Kurdan a li Rojhilatê Kurdistanê were çareserkirin. Pêdivî pê heye ku hemû hêzên Kurd di platformekê de werin ba hev û yekîtiya xwe ava bikin.” *R-4*

## Komên çete li şûna kurdan bi cih dikin



Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty Înternatîonal) raporek weşand û diyar kir ku dewleta Tirk û çeteyên wê li Efrînê zextên giran dikin û mafên mirovan binpê dikin. Di raporê de tê gotin bi derxistina Kurdan re, tê xwestin ku demografiya bajêr were guherandin û komên din li şûna Kurdan were bicihkirin. *R-4*

## Divê Tirkiye li Sûriyê weke dagirker bê dîtin



berdevkê fermî yê Navenda Têkiliyên Dîplomasiyê ya TEV-DEM’ê Kemal Akif civîneke çapemeniyê lidarxist û diyar kir ku kiryarên Tirkiyê yên li Efrînê ji bo pêşeroja Sûriyê metirsiyeke mezin e. Akîf bêdengiya civaka navnetewî ya li hember Efrînê jî şermezar kir û got, “Tirkiye divê li Sûriyê weke dewleteke dagirker were dîtin.” *R-5*

# Parêzeran tecrîd şermezar kirin

**Parêzerên kantona Kobanê bi daxuyaniyekê tecrîda dewleta tirk a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi tundî şermezar kirin. Di daxuyaniyê de hat diyar kirin ku dewleta Tirk destûrê nade parêzer û malbatê da ku biçin Îmraliyê û ev yek jî li dijî hemû qanûnên mafên mirovan yên navnetewî ye. Parêzeran bang li rêxistinên mafên mirovan kirin ku di vê mijarê de berpirsyariyên xwe bi cih bînin.**

Parêzerên kantona Kobanê bi daxuyaniyekê tecrîda dewleta tirk a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi tundî şermezar kirin.
Di çarçoveya helwestên li dijî tecrîda girankirî ya li ser rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan sendîkaya parêzeran a kantona Kobanê daxuyaniyek da û tecrîda li ser Ocalan şermezar kir.
Daxuyanî ji aliyê hevserokê sendîkayê Mihemed Etî ve li pêşiya avahiya sendîkayê hate xwendin.
Di daxuyaniya ku bi dehan parêzer amade bûn de wiha hate gotin: "Em destdirêjiyên derexlaqî yên dewleta tirk li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi tundî şermezar dikin. Rêgirtina dewleta tirk li pêşiya serdana parêzeran û malbatê dijî qanûn û pîvanan e. Bi taybet serdana parêzeran jî bi armanca temamkirina projeya aştiyê ye ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêşkêş kiriye.
Hikumeta Tirkiyê bi van kirinên xwe û destdirêjiyên li dijî gelê kurd û rêberê wî hemû qanûn û pîvanên navneteweyî yên girêdayî mafên mirovan binpê dike. Em bang li hemû deste û rêxistinên mafên mirovan dikin ku bi berpirsyariyên xwe yên mirovî rabin û zextê li hikumeta Tirkiyê bikin da ku Rêber Ocalan were azadkirin.
Li hemberî vê yekê hikumeta AKP'ê tecrîda li ser Rêber Ocalan hişktir dike û ji mafên wî yên herî xwezayî bê par dihêle. Armanca Tirkiyê ew e ku gelê kurd ji Rêber Ocalan dûr bixe û vîna azad a gel bişikîne."



## Divê saziyên mafên mirovan bi erka xwe rabin



Parêzer û hiqûqnasên navçeya Girkê Legê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku armanca tecrîdê rêgirtina li pêşiya belavbûna demokrasiyê ye.
Parêzeran diyar kirin ku tecrîd li dijî pîvanên mafên mirovan e û ji bo azadiya Ocalan banga bilindkirina têkoşînê kirin.




Parêzer Muhsên Elawî bal kişand ser tecrîda li ser Rêber Ocalan û qedexekirina serdanên xizm û parêzerên wî û diyar kir ku tecrîd li dijî hemû qanûnên navnetewî û qanûna mafên mirovan e û got: "Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zilmeke mezine. Bi tecrîdê hewl tê dayîn ku pêşiya demokrasiyê bê girtin û îradeya gelê kurd bê şikandin.
Elawî bang li aliyên têkildar û rêxistinên mafên mirovan kir ku bi berpirsyarî li hemberî tecrîda li ser Rêber Ocalan hatiye ferzkirin tevbigerin.
Hiqûqnas û endamê Rêxistina Mafên Mirovan a herêma Cizîrê Ebas Samî jî kirinên dewleta Tirk yên li dijî Rêber Ocalan weke destdirêjiya li dijî aştî û îradeya gelan û jiyana hevbeş bi nav kir û weke sûcekî dijmirovahî girt dest.
Samî diyar kir ku dewleta Tirk li dijî Rêber Ocalan hemû pîvanên navnetewî û însanî bin pê dike.
Samî bang li hemû parêzer û hiqûqnasan kir ku li hember kirinên dewleta Tirk yên li ser Ocalan helwesta xwe nîşan bidin.

## Dagirkeran li Şêrawa 25 kes revandin

Artêşa tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê bi dehan welatiyên sivîl ji navçeya Şêrawa ya Efrînê revandin. Di nava kesên revandî de 9 welatî ji gundê Birc Heyder in.
Destdirêjî û hovîtiya artêşa tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê li herêma Efrînê berdewam in.
Çavkaniyekî pêbawer ji navçeya Şêrawa ya Efrînê ragihand ku artêşa tirk û çeteyên wê bêtirî 25 welatiyên sivîl ên gundên Şêrawa revandin.
Heman çavkanî diyar kir ku wî hin navên welatiyên ji gundê Birc Heyderê hatine revandin belge kirine û ew jî ev in: "Seydo Elî Silêman, Gulê Xeyrî (30), Ebdilhey Zekeriya Hesen (25), Edhem Elî Hesen (16), Ehmed Mihemed Silêman (18), Egîd Reşîd Hesen (26), Ehmed Reşîd Hesen (22), Mihemed Hesen Nasiro (53) û Basil Ednan Mihemed Elî (22)."

## Buroya HSM'ê li Minbicê hat vekirin

Partiya Sûriya Pêşerojê buroya xwe li bajarê Minbicê hate vekir.
Partiya Sûriya Pêşerojê bi armanca berfirehkirina xebatên xwe, buroya xwe li bajarê Minbicê vekir.
Şandeyên ji parêzgehên Sûriyê, Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Îbrahîm Qeftan, nûnerên Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê, nûnerên saziyên sivîl û bi dehan şêniyên Minbicê beşdarî mersîmê vekirina buroyê bûn.
Di merasîmê de Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Îbrahîm Qeftan vekirina buroyê li şêniyên herêmê pîroz kir û got, "Wekî Partiya Sûriya Pêşerojê armanca me gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe bighînin hev. Em hemû ji şer û rijandina xwînê aciz bûn."
Qeftan di dawiya axaftina xwe de got, "Ji Sûriyeke demokratîk pirreng re erê û ji ne navendî re na."
Hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û gundewarên wê Nezîfe Xelo jî vekirina buroyê pîroz kir û wekî gaveke girîng ber bi avakirina Sûriyeke nû û pêkanîna hêviyên gelê Sûriyê ve bi nav kir.
Endama Buroya Jin a Partiya Sûriya Pêşerojê Seher Ûde jî axivî û anî ziman ku vekirina buroya partiyê li bajarê Minbicê peyameke li dijî desthildarî, dûrxistin û mudaxleyên derve ye.
Buro ji aliyê endamê Saziya Malbatên Şehîdan Îbrahîm Casim, bavê şehîd Mehmûd Casim ve hate vekirin…*ANHA*



## Hejmara miriyan ji ber erdhejê bû 319

Li girava Lambok a Endonezyayê Duşemê erdhej çêbûbû, ji ber erdhejê kesên ku mirin bûne 319.
Erdheja bi pileya 6,9 li gireva Lambok a dikeve başûrê welat pêk hatiye.
Li gorî bîlançoya Wezareta Tenduristiyê dayî, 319 kesan jiyana xwe ji dest dane, 156 hezar kes jî ji cih û mala xwe birine.
Di bîlançoya beriya vê de hatibû gotin ku 164 kesan jiyana xwe ji dest dabûn. Fikar hene ku hejmara kesên jiyana xwe ji dest dabin zêdetir bibin.
Di erdhejê de bi deh hezaran mal ziyan dîtin hilweşiyan. Piştî erdheja roja Yekşemê û şûnde welatiyê bi tirs û fikar derketin derve, di bin germahiya zêde de yan li rexê rê yan jî di bin konên li nava zeviyên birinc bi cih bûne.
Li gorî Enstîtûya Jeofîzîkî ya Amerîka pileya erdheja ku roja Pêncşemê rûdayî 5,9 pêk hatiye.
Ajansa Sîsmolojî ya Endonezyayê jî pileya wê weke 6,2 diyar kir.

## YPG'ê lê da, 6 leşker û çete hatin kuştin



Şervanên YPG/YPJ'ê bê navber derbên giran li Efrînê li artêşa Tirk û çeteyên girêdayî wê dide. Di 3 çalakiyên cihê yên serê meha Tebaxê ya li Efrînê de 6 leşker û çete hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku şervanên YPG/YPJ'ê li Efrînê li ser hev derbên giran li artêşa Tirk a digirker û komên çeteyên wê dixe. Di 3 çalakiyên cihê de bi giştî 6 leşker û çete hatin kuştin.
YPG'ê di daxuyaniya xwe de ev agahî parve kir:
"Di çarçoveya pêngava duyemîn ya Berxwedana Serdemê de hêzên me çalakiyên xwe yên li hember artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên di hundirê Efrînê de didomînin. Di hefteya yekemin ya meha Tebaxê de yekîneyên me bi 3 çalakiyên bi bandor leşker û çeteyên artêşa Tirk a dagirker kirin hedef. Di van çalakiyan de 6 çete û leşker hatin kuştin, 10 brîndar bûn.
Di dîroka 6'ê Tebaxê de hêzên me li herêma di navbera gundên Kebaşîn û Birc Heyder de wesayîtek leşkerî ya koma çete ya Feylaq Şam kirin hedef. Di encama çalakiyê de wesayît hat rûxandin û çeteyek hate kuştin.
Di heman rojê de yekîneyên me di navbera navenda bajarê Efrîn û navçeya Cindirêsê de wesayîtek zirxî ya artêşa Tirk a dagirker kirine hedef. Di encama çalakiyê de wesayît hate rûxandin, 2 leşkerên artêşa dagirker hatin kuştin û 3 çete brîndar bûn.
Di heman rojê de yekîneyên me hêzên polîs ên artêşa Tirk a dagirker di navenda bajarê Efrînê de kirin hedef. Di encama çalakiyê de 3 çete hatin kuştin û 7 çete brîndar bûn.
Di navbera dîrokên 5 û 6'ê Tebaxê de artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê, li bejahî û navenda navçeyên Raco, Bilbilê û Şiyê operasyoneke berfireh dan destpê kirin. Operasyon bêyî ku bigihîje encamekê vekişiya."

## Çeteyekî Feyleq El-Şam hate kuştin




Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê diyar kir ku di çalakiyeke taybet de yek ji çeteyên Feyleq El-Şam bi navê "Ehmed Mihemed Hemdan" hate kuştin.
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê derbarê mijarê de daxyanî da.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê roja 7'ê Tebaxê yek ji çeteyên Feyleq El-Şamê bi navê Ehemd Mihemed Hendan" kuştin.
Hate gotin ku çete Hemdan ji parêzgeha Humis a Sûriyê û li herêma Cindirês ya Efrînê li gel fermandarê Feyleq El-Şam Ebû Mucahid El-Humisî kar dikir û beşdarî şerê li dijî Efrînê, talankirina malên sivîlan bû û destê wê di rijandina xwîna sivlên Efrînê de heye.



# Hunermendên Cizîrê stranên Aram Tîgran gotin

**Di salvegera 9'emîn wefata hunermend Aram Tîgran de li bajarê Qamişlo ku Aram Tîgran lê ji dayîk buye, hunermendên herêma Cizîrê şahiyek bibîranînê lidarxistin. Di şahiyê de bi dehan hunermend û her wiha şêniyên bajêr û Endamên Rêveberiya Xweser jî amade bûn. Di şahiyê de hunermendan stranên Aram Tîgran gotin.**

Yektiya Hunermendên herêma Cizîrê bi boneya salvegera yekemîn a damezirandina Yekîtiya Hunermendan, her wiha ji bo bîranîna hunermend Aram Tîgran di salvebera 9'emîn a wefata wî de şevbêrkek li dar xistin.
Şevbêrik li Parka Dirîm Land a ku ji aliyê Yekîtiya Hunermendên Cizîrê ya li taxa Erbewiyê ya bajarê Qamişlo ve hatibû vekirin hate lidarxistin. Hejmarek zêde ji hunermendên Cizîrê, bi dehan şêniyên bajarê Qamişlo, şandeyeke ji Rêvebeirya Xweseriya Demokratîk a herêma Cizîrê tev li şevbêrkê bûn.
Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîran a Herêma Cizîrê Nezîr Mihemed bi xêrhatina beşdaran kir û diyar kir ku wan bi armanca bîranîna hunermend Arman Tîgiran ev şevbêrk li dar xistin û got, "Aram Tîgran bi stranên xwe hezkirina welat di dilê her kesê de çand û bi gelek zimanan û ji hemû baweriyan re stran got."
Paşê Koma Yekîtiya Hunermendan stranên şoreşgerî, her wiha stranên hunermend Aram Tîgran gotin. Her wiha hunermend Beha Şêxo jî di gel çepikan stranên Aram Tîgran gotin.
Hunermend Ednan Îbrahîm ji stranên bi zimanê Erebî, Suryanî û Ermenî gotin…*ANHA*





## Pêşbirka govendê hat lidarxistin



Bi durûşmeya " Em di dilê zarokên xwe de çand û hunera resen biçînin" Buroya Jin a Şaredariya Gel a Dêrikê pêşbirka govendên gelêrî ya zarokan birêxistin kir.
Buroya Jin a Şaredariya Gel a Dêrikê bi hevkariya Navenda Çand û Hunerê ya Dicle bi tevlêbûna komên zarokan "Koma Esala ya Til Hemîsê, Şengal a kamap Newroz, Govenda Kulîlka Koçerat û Koma Suryan a Yourthotha" pêşbirka govendên gelêrî organîze kir.
Pêşbirk li stada Kornêş a Dêrikê bi amadebûna bi sedan kesî hate lidarxistin.
Di pêşbirkê de Hevseroka Meclisa Şaredariya Gel Rojîn Çeto axivî û anî ziman çanda herêmê xwedî dîrokeke dirêj e. Rojîn anî ziman ku parastina çand û hunera resen nîşaneya resenbûna gelekî ye.
Piştre koman govendên xwe yên gelêrî pêşkêş kirin. Koma Aylanyayê ya girêdayî navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran stranên filklorî pêşkêş kirin.
Di pêşbirkê de, Koma Asala ya Til Hemîsê di asta yekemîn de, Koma Govenda Kulîlkên Koçerat asta duyemîn û koma Youthotha di asta sêyemîn serketin. Her sê komên serkeftî hatin xelatkirin…
*ANHA*

## Xelatên pêşbirka Wêjeyê ya Şehîd Denîz Firat hatin dayîn

Xelatên 4'emîn Pêşbirka Wênekêşan Çîrok û Helbestan a Şehîd Denîz Firat a diyarî şehîdê çapemeniya azad Rizgar Denîz hate kirin, hatin dayîn.
4'emîn Pêşbirka Wênekêşan Çîrok û Helbestan a Şehîd Denîz Firat a bi pêşengtiya YXA'ê li Wargeha Penaber a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) li salona konfaransê bi amadebûna sedan bejdarvanan, nûnerên saziyan û mêvanên derve bi deqeyek rêzgirtinê destpê kir.
Di merasîmê de dayika Şehîd Denîz Firat Sultan Yildiztan axivî û got: "Ez ê heta dawî şopdarê rêya Denîz û Rizgar bim."
Li ser navê malbata Şehîd Rizgar Adanmiş xwişka wê axivî û ev tişt got: "Denîz û Rizgar cihê xwe didile me de girtine. Ez gelek kêfxweşbûm ku ev pêşbirk ji bo Rizgar hatiye amadekirin. Ew di koçberiyê de mezin bû û şehîd ket. Dema ku Denîz şehîd ket Rizgar soz da ku kamêreya wê li erdê nehêle heya şehîd ket. Ez jî li vir soz didim kamereya wî li erdê nehêlim. Ez ê li ser şopa wî bimeşim."
Piştî axaftinan kesên hêjayî xelatê hatin dîtin, xelatên wan hatin dayîn.
Di rêze bernameyê de sînevizyona ku ji bo Şehîdên Çapemeniya Azad Şehîd Denîz Firat û Şehîd Rizgar Adanmiş hatî amadekirin hat nîşandan
Piştî temaşekirina sînevizyonê merasîma xelatdayînê destpê kir.



## 15'ê Tebaxê hestên muzîka şoreşgerî dewlemendtir kir



**Hozan Seyîdxan**


Muzîk û stran dengvedayîna hestên civakê ye. Her wiha ji destpêka dîroka şaristaniyê ve jî heye. Peywendî bi şêwazekî vergerîna şahî, êş û bûyerên jiyana civakê heye û destana a melodiyê ye. Xwedî bandoreke raste-rast li hestan dike. Bi vî aliyê xwe ve muzîk nikare ji jiyana mirov û civakê were cuda kirin. Ji ber ku modernîteya kapîtalîst vê yekê dizane ji bo rêvebirina bijarte û hestên mirovan geleki ji muzîkê sûdê distîne. Tiştê ku modernîte dixwaze bike ewe ku kesan ji dîrok û nirxên civakî qut bike û pêre jî li gor civaka şahî û pêşandanê li ser bingehê tevkujiya çandî asîmile û bihelîne. Ji ber ku di civaka pêşandanê de afrînerî tune ye, teqlîd heye. Ev jî tê wateya çêkirina kesayetiyek bênasme û bêpergal. Di bingehê wê de derbaskirina demên xweş û bêsûd hene. Berovajî vê yekê di kilam û stranên me de rastiyeke dîrokî û rêbazên exlaqê civakî heye. Bi hestên mirovan re rû bi rû ye.
Her pêngavek di hemû şoreşan de dibe sedema xwe guhertîna serdemekê. Mînak: di warên weke civakî, ramyarî, bîrdozî û her wisa di warê hunera stranbêjiyê de jî. Bi pêşengiya şoreşa azadiyê re,, berxwedana sala 1982`an ya di girtîgeha Amedê de bû çavkaniyeke hêzdayin û pêşxistina strana soresgerî ya berxwedêr.
Tevî ku beriya derketina şoreşa vejînê, bi dehan hunermend û dengbêjan di stran û hunera xwe de pesinê delaliya Kurdistan û doza azadiya Kurdîniyê jî dane, lê dîsan jî ji ber gelek sedeman ew rêbaz di xêzeke pir teng ya devkî û heremî de mabûn. Lê tevlî van tengasî û astengiyan dîsa jî ev berhem hetanî bi vê roja ku em tê de ne, weke mîrat û çavkaniyek resen ji me hunermend û nifşên pêşeroj re hiştine.
Bi pêngava vejîna 15`ê Tebaxê re qad û eniya stran û muzîk a şoreşgerî kete pêvajoyeke din. Tevî ku gelek hunermend û stranbêjên wê serdemê di serîde Koma Berxwedan ku hîna di destpêka salên tekoşînê de, berhemên hunerî û li gor daxwaza dem û tekoşînê afirandin, pêre jî misyonek şoreşgerî jî girte ber xwe u her endamek xwedî erkên dîrokî ji wê pêvajoyê re bû. Bi vê misyonê re pêşî li karê xweserane û pêre jî kesayetiya aloz û bê rêxistinkirî girt.
Helbet ji destpêka tekoşînê û şûnde, rastiya ku hişt Koma Berxwedan û hunermendên şoreşger rola xwe bilîzin, bibin dengê gel û pêşketiba şoreşê. Her wiha pêngaveke wiha bibe sedema pêşxistinên hunerî û civakî.
Bêguman pêvajoyeke wiha û ew serkeftinên dema xwe peywendî bi tekoşîn, ked û xebata şehîdên weke: Sefkan, Mizgîn û heta ya gelek hunermendên din yên şehîd re jî heye. Ev mînak di heman demê de, li dijî bandora moderniteya kapîtalîst, li dijî takakesîtiya popîlîst ya li hemberî kolektîfizimê bûye bersivek bingehîn!.
Wateya 15´ê Tebaxê ji bo gelê Kurd çiqas girîng be,e wqas rê li ber gehşkirina hunera Kurdî a şoreşgerî vekiriye. Herwiha li hemberî hunera asîmîlasyonê li çar perçên Kurdistanê qada wêrekî û afirandkariyê jî ji hunermendên Kurd re berfirehtir kir.
Stran û awazên ku di bin bandora pengava 15´ê Tebaxê da hatine afirandin, xwedî bandorek pir mezin li ser gûherandinên" hişê civakê" danîye. Berê sedan ciwanen Kurd daye eniya doza azadiyê.
Ji wan berheman çend stranên naskirî wiha ne: Tifinga min, serî hilde, Bijî biji hevak Egîd, Hey Botan Botan Botanê, Çerxa şoreşê, Ey şehîd- şehîd, Kizil guler açinca, Kurdistan daglarinda, Gerîla gerîla, top û tifeng Gerîlla û hwd. Bi dehan stranên din ku ketine nava dil û hê jî li ser zimanê xelkê têne bihîstin û gotin.
Îro gelê me li Rojavayê Kurdistanê şoreşa gel, bi awayekî awarte û hunerî roj bi roj mîna tevnê ser darê bi ked û ronahiya çavan tê neqişkirin û birê ve diçe. Bingeha paşerojeke tije asoyên xweş û azad diafirîne. Ev şoreş ji aliyê hemû Kurdan ve wek rojeva sereke tê pejirandin.
Bi kurtî weke ku li jorê jî hatiye dest nîşankirin, divê hemû hunermend xwe ji kêmasiyan rizgar bikin û hunera şoreşgerî û çanda otantîk ya resen ji xwe re bikin bingeh û bi pêş bêxin.
Yanî careke din li rastiya dîroka xwe ya berxwedêr vegerin û di eniya çand û hunerê de bibin dengê şoreşa nû.
Li ser hîmên rêhevaltiya Şehid Mizgîn, Sefkan, Serhedan xwe ji nûve, bi hêz û rêxistin bikin û li ser vê bingehê bibin awaz û dengê netewa demokratîk ya azad.

# Reqa ji bermahiyên şer tê paqijkirin

**Xebatên ji nûve avakirina Reqayê bê navber dewam dike. Piştî ku Reqa di 17'ê Cotmeha 2017'an de ji aliyê QSD'ê de ji dagirkeriya DAIŞ'ê hat rizgarkirin dest bi xebatên paqijkirin û avakirinê hate kirin. Heta niha erdekî fireh ji bermahiyên şer hatiye paqijkirin.**



Endamê Komîteya Jinûve avakirina bajarê Reqayê Endezyar Abdullah El-Elî diyar ku heta niha erdeke berfirek ji bermahiyên şer ji navenda bajarê Reqayê hatiye baqijkirin û da zanîn komîteyê heta niha ji sedî 80 rêyên sereke û yên biçûk vekirine.
Xebatên Komîteya Jinûve Avakirinê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê yên rakirina bermahiyên şer, bendên ku ji axê hatine çêkirin ku DAIŞ`ê li pey xwe hiştibû ji bajarê Reqayê dewam dike.
Piştî rizgarkirina bajarê Reqayê di 17`ê Mijdara 2017`an de, Komîteya Jinûve Avakirinê ya Reqayê dest bi paqijkirina bajarê Reqayê ji bermahiyên şer kir û xebatên wan bê navber dewam dike.
Piştî paqijkirina kolana Basil, komîteyê dest bi paqijkirina taxa El-Nehda kir(kolana tirênê).
Endamê Komîteya Jinûve Avakirina bajarê Reqayê Endizyar Abdullah El-Elî diyar ku heta niha erdekî fireh ji bermahiyên şer ji navenda bajarê Reqayê hatiye baqijkirin.
Her wiha komîteyê heta niha ji sedî 80 riyên sereke û yên biçûk vekirine…*ANHA*



## Şaredariya Tirbespiyê daxwazên şêniyan bi cih tîne



Şaredariya Ge l a navçeya Tirbespiyê hinek ji daxwazên şêniyên navçeyê bi cih anîn, wekî veguhestina cihê sergo, kolandina bîran. Niha jî şaredarî rêzeprojeyên xizmetguzariyê mîna sererastikirina toreya kanalîzasyonê û qîrkirina riyan amade dike.

Di van demên dawî de piştî rexneyên welatiyan ji ber bêhna qirêj, şaredariya Tirbespiyê cihê sergo veguhest. Her wiha Buroya Jin a Şaredariyê pêngava paqijkirina sûka navendî, pir û çem dest pê kir.
Ji bo çareserkirina pirsgirêka avê li navçeyê, şaredarî di van demên dawî de, 3 bîr di nav baxçeyên navçeyê koland û dar di nav wan baxçeyan de çand. Şaredarî li ser rexne û daxwaza şêniyên navçeyê ji bo pirsgirêka firinan û nebaşbûna nan, mudaxele kir û ew pirsgirêk çareser kir.

### PROJEYÊN XIZMETGUZARIYÊ

Piştî ku Meclisa Qamişlo, 25 milyon lîreyên Sûriyê ji bo Şaredariya Gel a navçeya Tirbespiyê veqetand, şaredarî di demên dawî de amadekariyên pêşkeşkirina projeyên xizmetguzariyê dike.
Ji wan projeyan sererastkirina toreyên kanalîzasyonê li taxa El-Colan û li ser dirêjahiya El-Muheleq ê başûr sazkirin.
Hevseroka Şaredariya Gel a navçeya Tirbespiyê Sûad El-Hisên destnîşan kir ku wan ji bo diyarkirina rêyên ku pir ziyan dîtine, komîteyek ava kirine û wê di demek kurt de werin qîrkirin.
Ji aliyekî din ve jî, Buroya Jin a Şaredariya Gel a navçeya Tirbespiyê amadekariyên vekirina baxçeyekê li nêzî depoya Fransî li navenda navçeyê dike.
Her wiha amadekariyên avakirina çerxeriyekê li rojhilatê navçeyê jî dike.
Her wiha ji bo çareserkirina qerebalixa tirafîkê, şaredarî projeya veguhestina rawestgeha gundan li derdora navçeyê nîqaş dike.
Komîteyên tenduristî û kontrolkirinê ji bo parastina tendrûstiya welatiyan, rojane di nav navçeyê de digerin û çavdêriya madeyên xwarinê dikin…*ANHA*

## Welatiyên Efrînê bê hilberîn namînin

Şêniyên Efrînê yên ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk neçar man ji malên xwe derkevin û Şehbayê bi cih bibin, niha hilberîna sebzeyên ku çandibûn kirin. Çandiniya ku kirin 30 malbat pê debara xwe dikin.
Welatiyên Efrînê bi çavdêriya Tevgera Civaka Demokratîk, dest bi çandina sebze û fêkiyan kirin.
Li ser erdekeî bi firehiya 60 hektar sebzeyên havînê weke bacanên reş, zebeş, petîx, îsot, kundir, bamî, bacanên sor û hwd, çandin.
Niha welatî berhemên xwe berhev dikin. Zêdetirî 30 kes di xebatên berhevkirinê de kar dikin.
Hilberîn rojane bi rêya komînan li ser şêniyên Efrînê li gund û deverên Şehbayê tê belav kirin û li kampên Berxwedan û Serdemê jî tê belavkirin.
Têkildarî mijarê, welatiyê bi navê Zekî Necar yek ji karkerên projeya çandiniyê ye, diyar kir ku wan bi derfetên xwe zeviyên çandiniyê peyda kirin, ji bermahiyên DAIŞ'ê paqij kirin û bi alavên çandiniyê yên heyî jinûve bi sebze û fêkiyan çandin.
Zekî diyar kir ku ew niha ji bo çandina sebze û fêkiyên zivistanê wê bixebitin…*ANHA*



## Hin taxên Dêrikê bê av mane



Li hin taxên bajarê Dêrikê pirsgirêka avê heye. Welatiyên taxên ku av naghêje wan gazincan dikin.
Li bajarê Dêrikê 23 bîr hene, lê li hin taxên mîna "Şehîd Xebat û Bawliya av bi rojan qut dibe.
Derbarê mijarê de, welatiyê bi navê Mihemed Emîn Derwîş ji taxa Şehîd Xebat anî ziman ku ji ber zêde xerçkirina avê li hin deveran, hin deverên din bê nav dimînin û got, "Gelek kes ava vexwarinê ji bo şûştina erebeyan, rêya, an jî avdana çandiniyê bi kar tînin."
Welatiya bi navê Nizha Cewher ji taxa Bawliya ye anî ziman ku li taxa wê av kêm e û destnîşan kir ku av derengî şevê tê û neçar dimînin di wê derengiya şevê depoyan dagirin. Nizha da zanîn ku av zêde tê xeçkirin.
Hevserokê Muduriyeta Avê ya Şaredariya Gel a Dêrikê Mihemed Emîn Hacî anî ziman ku di herdu mehên dawî de û germa zêde jenerator xirab bûne û destnîşan kir ku tevî 23 bîr û 6 pompên avê, ji bendava Sefan av naghêje hin malên li taxa Şehîd Xebat. Hacî diyar kir ku sedema qutbûna avê pirsgirêkên xetan û xerçkirina zêde ye.
Mihemed Emîn Hacî diyar kir ku wan projeya kolandina 4 bîran li taxên Bawliya, Sor, Xêrka û Şehîda Xebat, pêşkêşî Desteya Şaredariyan kiriye…*ANHA*

### RAMANÊ RÊBERTIYÊ



## Sosyalîzm û Kapîtalîzm -5-

**Abdulah Ocalan**

Eger hûn bala xwe bidinê, em bi vê nêzîkatiya xwe, rêbazên weke civaka berê û civaka nû yan jî binavkirinên civakî yên weke koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst an jî rêbazên li ser xeteke rast pêşdeçûn û kurtebirr bi kar nayînin. Em li ser bingehê pêşdeçûn, yekparebûn, azadbûn û cudabûnên civakî têgînên mîna wekheviyê dikin bingehê nêzîkatiya xwe. Ji vê jî girîngtir, em sosyalîzmê weke rewşeke civakê ya paşerojê piştî şoreşê yan jî beridînê pêk bê, nanirxînin. Jixwe nêzîkatiyeke bi vî rengî bi rastiya jiyanê re ya di xwezaya civakê de heye, li hev nake. Cinsê mirov timî civakî ye. Rabihurî-niha-paşeroj bi jihevkirinê pêk nayên. Hersê rewş jî di zikhev de ne, û bi hev re pêk tên. Kêliya niha bi qasî ku rabihurî ye, ewqasî jî paşeroj e. Li vir, pêdivî bi nêzîkatiyeke rast a felsefî heye. Mirov felsefeya zeman weke rabihuriya bêserî yan jî paşeroja bêdawî binirxîne, zêde manedar nîne. Mirov dikare zeman bi tenê weke pêkhatina hebûnê bide naskirin. Ango pêkhatina her hebûnê zemanê wê ye. Wekî din jî ti zeman tineye. Wexta wisa dibe, zemanê civakê jî dibe pêkhatina wê. Li gorî ku civak jî timî di nava rewşeke pêkhatinê de ye, rabihurî-niha-paşeroj jî di nava hev de ne, mundemiç in, veşartî ne. Lewma fikra pêkhatina civakê bi navberên dirêj li ser xeteke rast a qonax bi qonax şaş e, û wê rê li ber nirxandinên civakî yên nepêkan veke ku mirov nikare ji binî derkeve.
Mirov rastiya civakî timî têrûtijî pêk bîne, wê bi heyecana pêkhatina kêliya di nava tevahiya rabihuriya kombûyî de pêk tê û bi hêviyên bêserûbinî yên paşerojê pêk bîne, ev rastiya jiyanê ya herî nêzî heqîqetê ye. Gelekî girîng e ku mirov pêkanîna şêwazekî bi vî rengî yê jiyanê weke pirsgirêkeke bingehîn a teoriya sosyalîst û pratîka wê bibîne. Ev pêkhatin hem weke pêkhatina rast a heqîqeta civakî û hem jî weke îfadeya wê manedar dibe. Li şûna ku mirov sosyalîzmê bi tenê weke projeyek an jî bernameyeke der barê paşerojê de bibîne, divê mirov wê weke şêwazekî jiyanê yê exlaqî û polîtîk ê xwedî nirxekî estetîk ku kêlî bi kêlî azad û wekhev dike û edaletê li ber çavan digire, bibîne û bike heqîqet. Sosyalîzm şêwazekî jiyanê ye ku bi zanebûn heqîqetê îfade dike. Divê mirov bi şêwazekî weke yê mumîn û zanyarên mînakên wan gelekî di dîrokê de hatine dîtin rabe, û divê mirov weke mumîn û zanyarên demê bijî. Ferdperestiya lîberalîzmê ku di warê exlaq de piçûkketin û rezîlbûnê îfade dike, azadî nîne, berevajî şêweyekî herî rezîl ê koletiyê ye ku bi serwextbûneke sexte û qelp li ser piyan tê girtin. Sosyalîzm weke antî-lîberalîzmê îdeolojiya jiyanê ye ku mirov azadiyê bi awayekî kolektîf di exlaq û çalakiyê de pêk tînin.



# 3. Kongreya YJC'ê hat lidarxistin

***Sêyemîn Kongreya Yekîtiya Jinên Ciwan (YJC) roja 8'ê mehê li Navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran a li Rimêlanê bi beşdariya 800 delegeyên ji bakurê Sûriyê hat lidarxistin. Di kongreyê de xebatên du salan yên yekîtiyê hatin nirxandin û ji bo dema pêş biryarên girîgn hatin girtin. Her wiha di kongreyê de Meclîsa Jinên Ciwan ya Bakurê Sûriyê ji 23 endaman hat avakirin.***



Sêyemîn Kongreya YJC'ê bi biryaran û hilbijartina meclisa nû bi dawî bû.
Kongreya Sêyemîn a YJC'ê bi durûşmeya "Bi felsefeya Rêber Apo em ê dagirkeriyê têk bibin, bi pêşengiya jinên ciwan em ê Sûriyeke azad ava bikin" li Navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran li bajarokê Rimêlan ê bi tevlêbûna 800 delegeyên ji tevahiya herêmên Bakurê Sûriyê roja 8'ê mehê pêk hat.
Piştî nîqaşên derbarê xebatên du salan ên yekîtiyê, kongre bi biryaran bi dawî bû.
Di kongreyê de hin biryarên hatine girtin wiha ne;
-Yekîtiya Jinên Ciwan perspektîfên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo xebata xwe ya avakirina Sûriyeke Demokratîk esas digire û ji bo azadiya Ocalan têdikoşe.
-Yekîtiya Jinên Ciwan xwe wekî pêşengê avakirina Sûriyeke demokartîk dibîne û xebatên xwe li ser vê esas pêk tîne.
-Yekîtiya Jinên Ciwan ji bo azadiya jin û civakê têdikoşe û Jineolojî esas digire.
- Yekîtiya Jinên Ciwan rêxistinkirina tevahî Sûriyê armanc dike û li hemberî zihniyeta kapîtalîst disekine.
-Jinên Ciwan YPG û YPJ'ê wekî hêzên parastina civakê dibîne û ji bo mezinkirina wê dixebite.
-Jinên Ciwan parastina çand û nasnameya civakê dike.
Di dawiya kongreyê de 23 endamên meclisa Yekîtiya Jinên Ciwan li Bakurê Sûriyê hatin hilbijartin.

## Şoreşa jin li Bakurê Sûriyê pêk tê



Foza Yûsif di Sêyemîn Kongreya YJC'ê de axivî û diyar kir şoreşa Jin ku li Rojava dest pê kir, îro li Reqa, Tebqa û Dêrazorê tê pêk tê û got, "Tevlêbûna vê kongreyê jî nîşaneya vê yekê ye."
Kongreya Sêyemîn a YJC'ê bi durûşmeya "Bi felsefeya Rêber Apo em ê dagirkeriyê têk bibin, bi pêşengiya jinên ciwan em ê Sûriyeke azad ava bikin" li Navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgran li bajarokê Rimêlan ê bi tevlêbûna 800 delegeyên ji tevahiya herêmên Bakurê Sûriyê pêk hat.
Hevseroka Desteya Rêveber a Meclisa Damezrîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê Foza Yûsif jî di kongreyê de axivî.
Foza Yûsif got, "Em li pêşberî dijminekî hevpar in, dijminê me pergala desthilatdar e ya ku ked û xebata jin înkar dike. Ev pergal hewl dide bi hemû rêbazan destkeftiyên jinên Rojava û Bakurê Sûriyê têk bibin."
Foza Yûsif di berdewama axaftina xwe de got, "Divê jin xwedî biryar be, xwedî zanist be, nas bike çawa destkeftiyên xwe bi parêze. Ji vê yekê jî pêwîste di serî de xwe di aliyê fikirî û leşkerî de xurt bike da ku nasnameya xwe biparêze."
Foza Yûsif anî ziman ku parastina destkeftiyên jin li rojava û bakurê Sûriyê misogeriya parastin û destkeftiyên jin li hevahî Sûriyê ye û wiha dewam kir, "Ji ber ku şoreşa jin li Rojava dest pê kir, îro li Reqa, Tebqa û Derazorê pêk tê, nîşaneya vê yekê beşdarîbûna jinên ciwan ên ji van herêman ji bo kongreyê ye."
Foza Yûsif di dawiya axaftina xwe de kongre li hemû jinên ciwan pîroz kir û hêvî kir ku kongre encamên girîng ku hêviyên jinan pêk bîne , bigire û diyar kir kongre bi keda şehîdan hatiye lidarxistin…
*ANHA*

## 7.Kongireya kongra Star bi hezar deleg li darbikeve



**Ferîşte NEZÎR**

Kongreya Satar di bin dûrûşmeya "Bi rihê Berxwedana Serdemê ev şoreşa jin veguherînin şoreşa civakî" ku di meha Tîrmehê de li herêm û kantonên Rojava hatin li darxistin bi biryarên girîn hatin bi dawî kirin.
Piştî Konferansê dê di 16'ê Tebaxê de 7.Kongreya Kongera Star li ser asta Bakurê Sûriyê li Herêma Cizîrê bê lidraxistin. Têkîldarê mijarê Rêvebira Kongra star a kantona Qamişlo Medya Mehmûd diyar kir ku di 7.Kongrê de hezar delege bêne vexwendin."

### 7.KONGREA TÊ LİDARXİSTİN

Endama Rêvebira Kongra Star a kantona Qamişlo Mîdiya Mehemûd ser li darxistina 7.Kongra Kongera star ev agahî dan: "Di destpêka Meha Tîrmehê de hazirtiyên li darxistina konferanên kongera star hate kirin û li Herêma Cizîr, Kobanê û Şehbayê hatin li darxist, her wiha ev konferans bi biryar û encamên serkeftî bi dawî bûn. Armanc ji van konferansên ku hatin lidarxistin ku ser sîstema nû sîstema Netewa Demokartîk ber bi Sûriyek demokratîk ve xwe bi rêxistin bikin. Ji bo wê jî cara yekemîn ku bi vî rengî konferan li hatin li darxistin."

### HEZAR DELEGE BÊNE VEXWENDIN

Mîdiya diyar kir ku niha hazirtiyê li darxistina 7.Kongra Konreya Star dikin û wiha domand: "Dê 7.Kongra di 16'ê Tebaxê ser du rojan li bajarê Rimêlan li navenda çand û hunera Aram Tîgran ser asta Bakurê Sûriyê bê li darxistin. Ev kongera asayî ye ku her du salan carekê ji bo nirxandina xebatê du slan tê li darxistin. Her wiha dê hezar delege bêne vexwendin û wiha got: "Heya niha nûnerên û endamên Kongera Star ji Bakurê Sûriyê û derveyî wê wekî ji Lubnan, Bakur, Başûr û ji Rojhilatê Kurdistanê hatine vexwendin, di heman demê de hemû sazî û dezgehên jinê ku zêdeyî hezar deleg jibo beşdarbûna 7.Kongereya Kongera Star hatine vexwendin. Mîdiya bi bîrxist ku ji ber ku cihê li darxistina konreê meztirba dê delege ji wiha zêdetirba."

### JİN DİBİN SÎWANA KONGRA STAR DE XWE BİRÊXİSTİN DİKİN

Mîdiya bal kişand ser hijmar û tevlî bûna jinan zêde ji kongrayê re û got: "Ev cara yekemîne ku di kongireyê ewqas delege têne vexwendin, lê ev xwezayî ye ji ber ku akongra star sal bi sal rêxistina xwe ber ferehtir dike û tevlî bûna jina her diçe zêde dibe. Taybet piştî rizgarkirina Herêmên mîna Minbic, Reqa, Tebqa û Şedadê ku tavlî bûna jinên Erbe zêdeye, di heman demê de ew partiyên ku dibin sîwana kongra Star de xwe birêxstin dikin, lê êdî ew partiyên ku neketibûn baneya me de, wan doz kirin ku tevlî sîstema Kongera Star bibim û li gorî sîstema Netewa demokratîk xwe rêxistin bikin."

### KONGRE LÊVEGERA JİNA YE

Mîdeya Mehemûd wiha bi dawî kir: "kongera star ji bo jinan wekî lêvegereke. ew hijamar hezara delege jî isbat dike ku çiqas kongra star roj bi roj rêxistin û xwebat ferhetir dike. dema ku rêxıstina star ji yekîtî bû Kongira Star, ji ber ku em ber bi Sûreyek Demokratîk ve diçin li ser vê bingehê hemû netewên ku di Bakurê Sûriyê de dijîn cihê xwe di kongreya Star de bi girtin."

## Perwerdeya 27 jinan bi dawî bû



Li Akademiya Şehîd Şîlan a girêdayî Rêxistina Kongreya Star a bajarê Kobanê dewreya yekemîn a bi navê "Şehîdên Komkujiya 25'ê Hezîranê" ku 27 jin tev li bibûn bi dawî bû.
Akademiya Şehîd Şîlan a girêdayî Rêxistina Kongreya Star a bajarê Kobanê beriya 45 rojan û bi tevlêbûna 27 jinan dewreyeke perwerdeyê bi navê "Şehîdên Komkujiya 25'ê Hezîranê " dabû destpêkirin.
Di dewreyê de li ser mijarên cuda ders hatin dîtin.
Bi armanca qedandina dewreyê merasîmek li avahiyê akademiyê hate lidarxistin. Di merasîmê de şandeyeke ji Îspanya û rêveberên Kongreya Star amade bûn.
Di merasîmê de Hevseroka Meclisa TEV-DEM'ê ya kantona Kobanê Eyşe Efendî axivî. Eyşe Efendî bi dawîbûna dewreyê pîroz kir û hêvî ji kesên tevlî perwerdeyê bibûn kir ku xebata xwe li gorî felefeya Netewa Demokratîk a ku Ocalan pêşniyar kiriye bi rêk û pêk birêvebibin û got, "Felsefeya Rêber Apo jiyaneke azad e."
Eyşe Efendî wiha got, "Bi hezaran mêvan tên Kobanê û karê me dişopînin, bi taybet jî kar û xebata jin, tevî ku derferên me kêm in jî lê me heya niha gavên ber bi çav avêtin."
Ji kesên tev li dewreya perwerdeyê bûn, Ahîn Marûf e. Ahîn diyar kir ku ew poşman nebû ku tev li perwerdeyê bû û kêfweşiya xwe bi van gotinan anî ziman, "Me sûd ji vê perwerdeyê girt, perwerwerde ji bo me wekî jin pir girîng e, herî zêde me dîroka jin, rastiya rêbertî nas kir."
Ahîn Marûf bang li jinan kir ku beşdarî dewreyên perwerdeyê bibin…*ANHA*

